DÎTINEK JI DER VE

Xwedê û Şeytan hêşta sera gundê me bi şer in

Dr. Ebdulbaqî Mayî

abdulbaghi.ahmad@bupinst.uu.se

Eger em bîra xwe bînîn, gelek ji mêj nebû dema li gundê me bûye zêmar û tazî. Dovelankên "Ehrîmenî", bi harîkarya "Şeytanî", mêrg û aqarên gundê me dane ber barovên mirinê. Tiracîdîyên wek "Enfal" û "Reva Mezin" xelkê gundê me mişext kir. Hind jê mirin.... Hindek revîn qesta "Mîrê Miradan" kir, lê keftine devên gorga û li hemî qulaçkên dinyayê bêxwedan man.

Heta hîngê xelkê me digot Xwedê şerê hemî "Ehrîmenan" û "Şeytanan" diket, mizgeft çi xelkên gunehbar qebûl naket, mezar siyaran peya diket û ji ser pişta dewaran dihavête xar û goristan jî, xelkî bi daran ve dihelawîsît. Hîngê xelkê gundê me her Xwedê diniyasî û hemî deman di mala Xwedê ve kom dibûn, nivêj dikirin, rojî digirtin, hemî wexta dua û tika dikirin da Xwedê gundî biparêzît. Xelkê gundî hemî xem û astengên xwe bi hîvya Xwedê ve dihêlan.

Belê wextê xelkê gundê me mişext bûy, neşiyay xwe li ber hêreşên Ehrîmenî û hîle û hewalên Şeytanî bigrîtin û rêka revê daye ber xwe, Xwedê jî mala xwe bar kir. Ne mizgeftê dengek jê hat, nejî mezarê "Bapîrî" hîmetek kir ku gundê me biparêzît.

Hîngê bihara gundê me çirmisî û mir. Reşebay landik ji bana havêtne xar. Avahî hemî heriftin. Kanîk hişk bûn. Gul çirmisîn. Çiya mit bûn. Bêdeng girîn. Dehl û dira kolanên gundê me girtin. Rêk berze bûn. Şûnwar neman. Hemî teyr û tewalan mala xwe bar kir. Êdî ne dengê kewan hat, ne jî bangê çi dîkilan sihar îna. Hemî tişt mabûne bêdeng. Hemî tişt mabûne bêreng. Heta kevrên Çelî mit bûn, deng jê nehat da kes ne zanît yên girîn.

Evroke jî.... Xwedê û Şeytan sera gundê me her bi şer in. Xwedê yê bûy sunda serê xwepeqînan, hewara dij dagîrkeran, kirasê di ber xweragirên azadîxwaz. Şeytanî jî cil û berg yên li xwe guhorîn, wek decalî "ava tezî û îpraxên pîvazî" belav diket. Li pişt perda mafên mirovan û bi diroşma dîmoqrasiyê û li nav komên para û asinî, xwe di veşêrît. Lewma ew ne bi sanahî dête nasîn.

Xelkê me jî yê hatiye ve ser cihê bab û bapîran, qesta roja goyîna diket, belê naçîte nav gundî. Li jêr sîbera pêlên ewrî û hişêna "perên Sîmerxê "destên xwe yên bilind kirîn, yê dua diket, dîwaran li ser befrê dinijinît da gundekê wêrankirî ava biket. Xelkê gundî hêşta yê bi hîviya Xwedê ve û dûr nebîne bêy ku ageh ji xwe hebît, yê li pey dengê decalî diçît.